**Baldariya xwendinê bidin ber çavan**
Çîrokên li ser kesayet û mijarên bijare dilbijiya xwendinê bi pêş de dibin. Ji zaroka xwe re di dîtina pirtûkên fêdeyê bidinê de, bibin alîkar.




**Kêfxweşiya xwendinê parve bikin**
Bi zaroka xwe re li ser tiştên ew dixwîne bipeyivin. Danûstandin zaroka we dilxweş dike û hewesa domandina xwendinê dide zarokê.



**Medyaya dîjîtal bi hişmendî bikar bînin**
Kesên ku medyaya dîjîtal bikar tînin jî dixwînin. Bi zaroka xwe re derfetên ku xwendin û afirîneriyê teşwîq dikin kifş bikin.



**Serdana pirtûkxaneyan**
Pirtûkxaneyên gel ciyên balkêş in derbaskirina dema vala ne û derfetên curecûr didin ber zarokan. Bi zaroka xwe re pirtûkxaneya nêzî xwe kifş bikin.



# Zaroka min hînî xwendine dibe

Ji bo hînbûna xwendinê, hûn dikarin wiha alîkariya zaroka xwe bikin.




SIKJM
ISJM
ISMR

Kurdisch Kurmandschi /
Kurde Kurmandji / Curdo Kurmancî

### Pê re bidin û bistînin

Axavtineke rojane ya dewlemend ji bo hînbûna xwendinê hîmekî bingehîn ê girîng e.
Bi zaroka xwe re bi zimanê ku hûn herî zêde bi xwe bawer in, biaxivin.



### Her zarok bi lezûbeza xwe

Hînbûna xwendinê dem dixwaze û zehmet e.
Tişta girîng ew e, ku zaroka we wêrekiya xwe winda neke û ji bo pêşketinên pê re çêdibin, were xelatkirin.



### Xwendin diyariyek e

Ji zaroka xwe re di pêngavên hînbûna xwendinê de jî bi awayekî rêkûpêk bixwînin. Bi vî awayî hûn hezkirina zaroka xwe ya ji çîrokan re diparêzin.



### Bibin mînakek

Zarok li mezinên xwe dinêrin. Ji zaroka xwe re nîşan bidin, ku di jiyana we de ciyek girîng ê xwendinê heye.



Xetkirin: Patricia Keller

## Instîtuta Swîsrî ya ji bo Medyaya Zarok û Ciwanan SIKJM/ISJM/ISMR

SIKJM/ISJM/ISMR xwe ji bo wêjeya zarok û ciwanan û bipêşxistina xwendinê erkdar dibîne. Ew projeyên ku zarok û ciwan bi kêfxweşî têkevin cîhana ziman û wêjeyê bi rê ve dibe û nîşanî pispor û dêûbavan dike, bê ew çawa dikarin di pêşveçûna ziman û xwendina zarokan de alîkariya wan bikin.

Hûnê li ser malpera SIKJM/ISJM/ISMR **rênîşanên medyayê** yên curecûr ên xwendinê yên li gor qadên baldariyê û temenên cuda yên ji bo xwendina bi deng an xwendina xwe bi xwe bibînin.

Bi **Roja Xwendinê ya Swîsrî** û **Şeva vegotina çîrokan a Swîsrî,** SIKJM/ISJM/ISMR salê du caran çalakiyên neteweyî li dar dixe û tê de, zarok û ciwan dikarin bi hev re dilxweşiya çîrokan bijîn.

**Agahiyên zêdetir:**
www.sikjm.ch / www.isjm.ch / www.ismr.ch

SIKJM
ISJM
ISMR

Schweizerisches Institut
für Kinder- und Jugendmedien

Institut suisse
Jeunesse et Médias

Istituto svizzero
Media e Ragazzi